Min rahiştiye serê xwe

Arjen Arî

Her ku tu bi jor de bilind bibî, yên
li jêr dê biçûk bibin.
biçûktî: mezinahiya sibe…
çivîk jî biçûk e.

ji hemû 'biçûkan' ez ji
nefsbiçûkan hez dikim
û ji hemû teyran ji bazê çiyê!

Kelereşk li çolan dijî.
xilt di binê axê de-ku axê bi ser
serê xwe de didêre-
li tevî ya qumriyê meke
kûkûkûya bûmê
yek deştî yek berîvanî, çiyayî me
ez.
'Xom…Ew wextey ballindem'
navê dîwaneke Şerko:
Ez…wexta ku teyrek bûm.

'her teyr bi refê xwe re difire(i)ya
refê qulingan, yê reşêleyan…
gur dixwar miya ji kerî weqatayî
gotineke din bi guh ve wek
guhar mayî:
'kew…dijminê serê xwe!'

ez bi serê xwe, roj bi serê xwe
diçim, min rahiştiye serê xwe
li cihekî şev konê xwe vedigire
roj diçe ava bi tena serê xwe

19/06/2007/